

# ÇEND GOTIN DERBARÎ ROJA NÛ DE



*Haluk Öztürk*

*Redaktor û berpirsiyarê Roja Nû û Weşanên Roja Nû*

Kovara kurdî ya çandî Roja Nû, di navbera salên 1978 û 2001-ê de li Swêdê hatîye weşandin. Ew di nav weşanên kurdî de, yê ku li Ewropayê derketine ya here temendirêj e.

Roja Nû, di mijdara sala 1978-a de li Stokholmê wek organa Komela Karkerên Kurdistanê li Swêdê (KOMKAR-Swêd) dest bi weşanê kir. Di destpêkê de bi zimanên kurdî-tirkî, di formata rojnemeyekê de, mehê carekê derdiket. Naveroka wê derbarî kar û barên komelê de; deng û basên welat û cîhanê û nivîsên li ser ziman û çanda kurdî bûn. Wê di sala 1983-a de formata xwe guhart, êdî wek kovareke çandî ya tenê bi zimanê kurdî weşana xwe domand.

Di salên 70-yî de, li Kurdistana Bakur û Tirkîyê weşanên Partîya Sosyalîst a Kurdistanê "Rîya Azadî", "Roja Welat" û hin weşanên din ên kurdan dest pê kiribûn xwendina kurdî di nav gel de belav dikirin. Roja Nû jî di şopa wan de dest bi weşanê kir.

Roja Nû jî li dervayî welat beşdarî pêvajoya pêşxistin û geşkirina zimanê kurdî yê nivîsandinê bû, lê di destpêkê de hem nivîskar û hem jî xwendevanên kurdî kêmtir bûn. Wê wextê li tevaya Kurdistana Bakur kesên ku bi kurdî dixwendin û dinivîsandin bi tilîyan dihatin hejmartin.

Hingê di nivîsandina kurdî de helbestvanê kurdan ê mezin Cegerxwîn (ku nû hatibû Swêdê), Prof. Qanatê Kurdo, Têmtûrê Xelîl, Tosinê Reşîd û gelekên din jî alîkarîya Roja Nû kirin. Bi wextê re hejmara nivîskar û xwendevanên zimanê kurdî zêdetir bûn.

Her hejmara Roja Nû 800 an jî 1200 nusxe dihat çapkirin. Di sala 1999-a de bi 1500 nusxeyî derket. Kovar, bi 32-44 rûpelan û salê 4 hejmar derdiket (sal heye ku 3 hejmar derketîye) lê ji sala 1998-a pêve salê şeş hejmar derdiket. Bergên wê rengîn bûn û gelek wêne - nîgar tê de cî digirtin.

Kovar heta sala 1987-a li Swêdê û paşê li Kolnê di çapxana arizî ya KOMKARê de dihat çapkirin.

## **Bi kurtî çend taybetîyên Roja Nû:**

Roja Nû, berî her tiştî di pêşxistina zimanê kurdî yê nivîskî de roleke berbiçav leyîst. Wê herdem zimanekî hêsan û zelal bi kar anîye. Ji zimanê axaftinê zêde dûr neketîye. Ev rastî ji aliyê xwendevanan de jî hertim hatîye dîyarkirin û gotin

Roja Nû li dijî propaganda hêzên koloniyalîst û nijadperest ku hebûna gelê kurd, çand, ziman û dîroka wî înkâr dikin; nizim nîşan didin, bi xurtî derketîye.

Roja Nû ji bo nivîskar û helbestvanên nûgîhayî bûye platformeke baş ku ew bikaribin afrandinên xwe pêşkêşî xwendevanan bikin.

Roja Nû ji bo danasîna ziman, çand, wêje û zargotina kurdî bûye çavkanîyeke fêrbûn û zanînê. Derbarî edebîyata kurdî ya nû û kevin de, li ser kesên zimanzan, edebîyatnas, dîrokzan û kurdologên berê û

yên hevdem, hunermendên kurd û afrandinên wan gelek bend, hevpeyvîn û lêkolîn hatine weşandin. Xwendevanên Kurdistana Bakur karibûn derbarî gelek edîb û zanayên kurmançîya jêrîn de jî bixwînin û wan nas bikin; ji Baba Tahirê Hemedanî bigre heta Pîremêrd, Hejar, Goran, Şêrko Bêkes, Ebdulla Pêşew û yên din.

Roja Nû hertim cî daye deng û basên giring ên welêt. Ji têkoşîna azadîya gel û welatê me re piştgirîya xwe nîşan daye.

Roja Nû cî daye xebat û çalakîyên komelê (KOMKAR-Swêd) û deng û basên li Swêd. Ji çaralî dinyayê çalakîyên çandî yên kurdan wek deng û bas hatine belavkirin.

Roja Nû ji wêjeya cihanê jî hin nimûneyên bijarte wergerandine ser zimanê kurdî û weşandine.

Ji bo danasîna weşanên nûderketî, gelek caran di Roja Nû de rûpeleke taybetî cî girtîye.

Roja Nû gelek caran cî daye koşeyekî zarokan jî. Bi zimanekî sivik, gelek çîrok, têderxistinok û xaçepirs weşandine.

Roja Nû di vê jîyana xwe ya 21 salan de bû nimûneyeke baş ji bo xebata tevayî (kolektîf) û rêxistinî.

## **Kesên ku di amadekirin û rêvebirina kovara Roja Nû de kar kirine û yên ku tê de nivîsîne:**

Ji ber ku Roja Nû organa dezgehekî ye, keda gelek kesan di wê de heye. Heta sala 1996-a navê endamên redaksiyonê nedihatine dîyarkirin. Lê xasima destpêkê de keda Salîh Înce, Henefî Cebeblî û Haluk Öztürk mezin e. Haluk Öztürk 20 salan her di nav karê derxistin û rêvebirina Roja Nû de bûye. Wî bilî gelek nivîsên bê îmze, bi nasnavê Xalit Lezgîn û Azad Nûbar jî nivîsîye. Herweha Rohat Alakom (du salan berpirsiyarê weşanê bû), Selîm Can (Hasan Nûri Göçmen), İlhamî Tanış (A. Gernas, Dilsoz, A. Bawer), Kazım Budak (B. Dersim, Xebat) û Fahrî Ölçer (Evîndar Farqînî) bi salan di derxistina kovarê de xwedî ked in.

Cegerxwîn, Qanatê Kurdo, Kemal Burkay (Baran) Prof. Zera Üsiv, Akadêmîk Prof. Şekroyê Xudo, Ahmed Cengîz Çamlıbel (Vazgal Bazîdî), Têmuêrê Xelîl, Mecît Şêxo, Gundî (Sadiq Birîm), Newroz, Ehmed Şerîfî, Cankurd, Eskerê Boyîk, Tosînê Reşîd, Nûra Cewerî, Mûnzûr Çem, Bûbê Eser, Husên Hebeş, A. Balî, Yavuz Koçoğlu (B. Zinar), Sîpan (Nesîm Adiyaman), Mehmet Gültekin, Beşîr Botanî, Salih Omerî, Marîna Ezîz, Sebrîya Hekarî, Emîn Sindî, Sidqî Hirorî, B. Berfîn, Xalid Xoce (Ramazan Başdaş, Barîno), Ehmed Tewfîq, Hemîd Kilicaslan, Serdar Roşan, Silêman Alî, Silêman Demîr, Bekir Şahîn Soreklî, Mehmûd Lewendî, Riza Çolpan, Adıl Duran. A. Alxasî, Xelîl Duhokî, Fexredin Tahîr, Cemşîd Heyderî, Mazhar Kara, Cemal Xeznedar, Dr. Celadet Çeliker, Hacî Kardoxî, Nasrat Hacî, Dr. Rehber Rêzan, İzzet Hesenî, İbrahîm Zaxoyî û gelek kesên din di Roja Nû de nivîsîne.

Bê guman bi dehan, belkî bi sedan kesên din jî hene ji endamên Komeleyên KOMKARê yên li gelek welatên Ewropayê, ku di belavkirina Roja Nû û weşanên kurdî de xwedî ked û xizmeteke mezin in. Navê hemîyan em nikarin zanibin, loma spasî û malavayî ji hemîyan re! Me teva bi hevra baxçeyekî delal ê ziman û çanda kurdî avda, geşkir û şitlên nû têde çandin. Bi van xebatên me û yên gelek welatparêzên kurd ên din, zimanê me yê nivîskî gul veda. Pêşketina zimanê kurdî yê nivîskî her berdewam e.

Di dîroka rojnamegerîya kurdî de cîyê weşaneke mîna Roja Nû çî ye, wê di warê xwe de çî rol leyîstîye, bêguman wê piştî sal û zemanan ji alîyê lêkolîner û dîrokzanan ve bête nirxandin. Lê em wisa bawer dikin ku, Roja Nû xizmeteke berbiçav pêşkêşî ziman, çand û dîroka gelê me kirîye. Bêguman 21 sal û 103 hejmar ji bo weşaneke kurdî ya peryodîk ne tişteki hindik e. Belê li xerîbîyê, li surgûnê, êriş û

zordestîya dewletên neyar, kuştin û zîndan tunebû, lê dîsa jî astengî û dijwarî gelek bûn. Dûrbûna ji gel û welat, bi serê xwe dezavantajeke mezin bû. Berdewamkirina weşana Roja Nû bi ewqas sal, nîşana bawerî, hêvî, rikberî û biryardarîyeke xurt e.

### **Çapkirin û belavkirina pirtûkên kurdî û "Weşanên Roja Nû":**

"Weşanên Roja Nû" ji sala 1980î heta niha li dor 70 pirtûk pêskêşî lîteratûra kurdî kirîye. Pirtûkên nivîskar û zanyarên kurd ên eyan wek Cegerxwîn, prof. Qanatê Kurdo, Erebê Şemo, Kemal Burkay, Eskerê Boyîk û berhemên şairên me yên qedîmî wek Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyra, Mela Ehmedê Batê û gelekên din çap û belav kirine.

(Em ê navên hevalên me yên ku di kar û barê derxistina pirtûkan de jî xwedî ked in, di demeke pêş de, dema ku me pirtûk jî dijital kirin û li ser înternetê weşandin, bi taybetî binivîsin. Di bernameya me de heye, eger mîyêser be em ê hin pirtûkan jî li ser tora înternetê biweşînin).

Destxweşî û sipasîyeke bi taybet ji hevalê me, hêja Hasan Nûrî Göçmen re ku di amadekirin û belavkirina vê arşîva dîjîtal de jî xwedîyê keda mezin e.

**Stokholm- 15.10. 2014**

**Haluk Öztürk**

Endamên redaksîyona dawîn a Roja Nû



Haluk Öztürk  
(Redaktorê berpirsîyar)



Ehmed Cengîz Çamlıbel



Têmûrê Xelîl Mûradov



Hasan Nuri Göçmen